

Hevpeyvîn: ALÎ GULER/ERDAL ALIÇPINAR-ANF/
BRUKSEL

Werger: Mehabad F. ARDA / Amîda Kurd

2009-08-26 - Aram Tîgran... Gelek ji me xwediyê strana 'Ey Dîlberê' ji ekranên

televizyonan, an jî ji ser dikên konseran dinasin. Lê gelo em di rastiyê de Aram çiqasî dinasin? Hevjîna wî Sîrvat Malîkyan Tîgran vegot:



“Ew hunermendekî mezin û alîgirê aştiyê bû.” Piştî hewldanên dirêj ên brokratîk û dîplomatîk jî, wesiyeta Hunermandê muzîka kurdî û Êrmen Aram Tîgran a veşartina li Amedê, bi cîh nehat. Ev yek jî, bi qasî mirina wî, bû sedema keserek mezin di dilê dostên Aram û hemû Kurdan de û di nav wan de şopên kûr hişt. Derdora siyasî ya Kurd, di bin vî barî de elçiqî, lewra ji destê wan tiştê nehat. Aram Tîgran, li sirgûnê ji dayîk bû û li sirgûnê çû ber dilovaniya Xweda. Aram Tîgran Êrmen bû û kurê malbatek bû ku ji komkujiyê rizgar bûbû. Nebiyên kesên ku malbata Tîgran şandin sirgûniyê, îroj destûr nedan cenazê Aram bibine Amedê. Aram Tîgran, niha li sirgûniyê radizê. Herwekî Yılmaz Güney, Ahmet Kaya û Nazim Hikmet. Bê guman, ku ya herî zêde ber vê rewşê ket, hevjîna wî ya 53 salan, hevala wî û hemraza wî Sîrvat Malîkyan Tîgran bû. Bi qasî wendakirina Aram, êşa wê ya verêkirina Aram a li sirgûniyê jî mezin bû. Di merasîma cenazeyê Aram de hêstirên çavên Sîrvat Malîkyan û şîna wê, herkesî bi girî vekir. Bi taybet jî li hember gotinên wê yên ku bi “Aramê min îro bê hal e” dest pê dikirin, kesekî li ber xwe neda. Hêstirên çavên Kurd û Ermenan, ji bo Aram Tîgran li nav hev ketin. Me pirsra vî hunermendê ku herdu gelan anî ba hev, ji jina wî kir. Êşa xwe di nav xwe de veşart û got: “Peyama min ji Kurdên ku Aram hemêz kirin re heye: Aram evîndarê gelê Kurd bû. Heya ku mir jî ji bo kurdan xebitî. Kurdan jî îroj ew hembêz kirin û li çar aliyên cîhanê

ew bi bîr tînin. Ez spasiyên xwe pêşkêş dikim. Ew îroj li sirgûniyê ye, lê dê rojek teqez biçê Amedê. Hevalên wî kurd dê giyana wî şad bikin.”

‘EZ Ê ROJEK BIMIRIM LÊ DIVÊ EZ LI DÛ XWE DÎROKEK BIHÊLIM’

-Em Aram Tîgran ji ekranên televizyonan, li ser dikan, di destê wî de cumbuş û bi rawestana wî ya entellektuel dinasin. Ji bilî van hemuyan, Aram Tîgran kesek çewa bû?

-Ez 53 sal in bi Aram Tîgran re zewicandî me. Ew mirovek wisa bû ku timî li dû aştiyê baz dida. Ev Kurd e, Ermen e, an ji gelek din e, ferqek wisa tu carî nedikir. Aram Tîgran, beriya her tiştî bi hestên saf û pak dostê Kurdan bû. Bêyî hesab û berjewendiyan, Tu carî ji bo tiştên madî yên cîhanê nejiya. timî weha digot: “Ez ê rojek bimirim, lê divê li dû xwe dîrokek bihêlim.” Ez îroj baştir bi vê gotina Aram têdigêhêjim. Dinihêrim; di serî de Kurd û Ermen, gelek kes şîna Aram Tîgran digirin. Ev ji nêzikayiya wî ya ku tu ferq û meylê nedikir navbera gelan tê.

DI MUZÎKÊ DE TIMÎ STÎLEKA WÎ HEBÛ

-Muzîk ji bo Aram Tîgran dihat çi wateyê?

-Aram Tîgran, ne tenê şirovevanek bû. Di heman demê de besteyan çê dikir, notayan durust dikir û ensturman lê dida. Tu carî stranên kesên din nedigot. Timî besteyan çê dikir, notayan durust dikir. Timî dixwest tiştên nû çê bike. Ew kesekî hilberîner bû û li dû nûbûnan baz dida. Digot: “Divê ez tiştên wisa çê bikim ku bi kesekî re tunebin.” Cudahiyê Aram Tîgran hebû: Ji roja ku dest bi muzîkê kiriye û heya niha yek stîleka wî bi tenê hebû. Dengê xwe jî li gor vî awayî bi kar anî. Bi kinayî, muzîk ji bo wî jiyan bû.

-Gelek beste çê kirin, bi sedan stran gotin. Herî zêde ji kîjan stranên xwe hez dikir?

-Aram Tîgran, ji hemû stranên ku digotin, hez dikir. Hemû jî ji bo wî bi rûmet bûn. Lewre muzîk û huner ji bo Aram Tîgran jiyan bûn. Lê herî zêde ji berhemên xwe “Ey Dîlberê, “Çîyayê Gabaro“ û “Şev çû“ hez dikir. →